



Stadt K ln

**Xizmet n Bij ŝkiya
Der n  ya Zarok  
Xortan**





Pirrî caran dêûbav an fêrkar di dest-
pêkê da bi vê yekê dihesin ku tişteki
„Durist nîne”. Nîşaneyên ku îhtimal
heye ji ber pirsgirêka derûnî ya zarok
û nûciwanan bin, gelekî cihêreng in.

Max berdewam wekî dînan di fêrkariyê
da nakokiyê çê dike û di demên din
da jî bi awayekî ber bi zêdebûnê va
êrîşkarane tev digere!

Liane gelekî hez nake tişteki bixwe, ji ber
ku nîgeran e ku di vê rewşê de gelekî
zêde „Qelew” dibe. Tevî vêya heta bi
nêrîna hevalên xwe tenê weke „Xêzek di
asoyê da” (gelekî jar) e!

Georg naxwaze ku biçê dibistanê, pirrî caran dilêş û serêş pê ra heye! Helbet lînêrînên cûr bi cûr ji aliyê bijîşkê zarokan va nekarî ti sedemeke leşî tê derxînin!

Dimitri zêdetir ji berê xwe ji komê dûr dike û gelekî damayî û depress xuya dike! Wî heta pêştir gotiye ku êdî ti meyl û meraqeke wî ji bo jiyanê nemaye!

Johanna pirrî caran qala tirs û nîgeraniyên xwe dike, ti kes sedema wê yekê nizane. Gelo tevî vêya bi rastî hemî tişt baş xuya dike?!

Em di warê kêşeyên derûnî yên zarok û xortan û terapiya derûnî şewirîne didin zarok, nûciwan, dêûbav û endamên xebatên fêrkariyê (fêrkar, perwerdekar, alîkarîgihanên civakî).

Piştî diyarbûna daxwaza kesane, em li gorî meyl û daxwazê heta bi dil û can piştevaniyê didomînin da ku alîkariyeke guncan bi hev ra were dîtin.

Tîma Şêwirînê ya profesiyonal di çend warên da xizmetên bijîşkiya derûnî ya zarok û xortan da li Rêveberiya Tenduristiyê di bin rêveberiya bijîşkê pîspor da ye.

Şêwirîn bi giştî li Rêveberiya Tenduristiyê pêk tê. Di hin babetan da şêwirîn li dibistana zarok/nûciwan an jî li malê jî pêkan e.

Şêwirîna nûciwanan bêyî erêkirina dêûbavan jî pêkan e.

Xizmetên me belaş û bêpere ne.

Em pêwîstiya parastina nihêniyan dişopînin.



Hevahengkirina demên şêwirîna bi me ra
bi rêya telefonê an jî Emailê pêkan e.

Gesundheitsamt Köln

KJP-Beratungsdienst

Neumarkt 15 – 21

50667 Köln

Telefon: 0221 221-24705 oder -25251

Faks: 0221 221-6569689

kjp-dienst@stadt-koeln.de

Derfeta destragihîştina telefonî:

Duşem heta Pêncşemê: Saet 9-12 û 13-14

În: Saet 9-12

Baskên din li rêvebera welatiyan a
Mülheim û Rêveberiya Welatiyan a
Kalkê ne.

Li vir tu dikarî daxuyaniyê bi
zimanên din bibînî:





Stadt Köln

Die Oberbürgermeisterin

Gesundheitsamt

Amt für Presse- und Öffentlichkeitsarbeit

Gestaltung und Druck

Zentrale Dienste der Stadt Köln

Bildnachweis

Slavomir Pancevac/AdobeStock.com,

Ozgur Coskun/AdobeStock.com

13-Si/234-22/53/500/10.2022